Bilind Mihemed

Gilîzank

Di tilefonê de hemû
peyvên xweşik
Di min diwerîne
Li hember min radiweste,
peyv
Diçine zêra û tenê awirên
te peyvzêr
Dibin.
Xanim
Daveka pirça te
Bibe qenare û gerdena min
bikeve nav
Dê bi pişkurînekê
Çavên xwe nivînim.
Ji dil ez û tu mîna belgên
bayîzî
Baqijtir bûne!
Çi dê min û te kite
bihareka tîjxemil
Çi dê min kite zarokekê
Sava û bo hembêza te
westîkê bike?
Çi dê te kite xewneka çav
bi kil
Û min jî siwarekê bê
hevrik û li pişt xwe te
siwarkim û
Asoyê bişeqînim
Deryayê bişeqînim
Dûr dûr
Li nav cergekê
Zendeka min bibe balîfk û
Pirça te rûkê min bigezîne
Eha hîngê
Di nav payîzeka pîr de dê
bibin
du belgên rengîn û
dûmahiya çîroka me ya
payîzê dê bi maçekê eşqa
me
Ragehîne.